



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 15

Keştiya Tofanê û Çiyayên Kurdistanê di Mîtologiya Somerî da

Hêrsa Xwedawendan:

Bi me ra derbas bû ku sê xwedawend serpereştên *Civata Xwedawendî Somerî* bûn (*An, Anlil, Anki*), û me dîsa gotibû ku li tenîşt van hin xwedawendên din jî ji bo hin peywir û erkên taybet hebûn. Peywira xwedawend "*Iya*" sihirdarî, remildarî û parastina mirovan ji nexweşî û belayan bû. Xwedawend "*Nînût*" (*Mamî*) di afirandina mirovan da ji çipil û heriyê beşdar bûbû, û radeya Xwedawendên "*Anunnaki*" piştî radeya xwedawendên mezin dihat. Erk û peywira xwedawendên "*Agigi*" jî rabûna bi kar û xebatên zor û zehmet bû.

Hatiye gotin ku xwedawendên "*Agigi*" piştî sê hezar û şeşsed sal êdî ji karên zor û zehmet bêzar bûn û li dijî xwedawend "*Anlil*" serî hiladn, qeyd û bendên xwe sotandin (şewitandin), çekên xwe rakirin, bi şev êriş xwedawend "*Anlil*" kirin û dora wî di cihê wî da, yê bi navê "*E-Kur*" çarmedor pêçan û girêdan. Peywan û nobetdaran bi lez xwedawend "*Anlil*" ji xew rakirin û jêra gotin ku xwedawendên "*Agigi*" li dijî wî serî hildane û dora wî di nawenda wî da pêçane. Xwedawend "*Anlil*" li metirsiya li ser wî haydar bû, û rabû mezinên xwedawendan derbarê serhildana xwedawendên "*Agigi*" ji bo şewir û dewanê civandin ku çareyekê bibînin.

Piştî ku xwedawend "*Anlil*" sedema serhildana xwedawendên "*Agigi*" naskir, rabû ji xwedayê xwe "*Nînût*" xwast ku (wek bi me ra derbas bû ku mirovan biafirîne) daku ew li cihê xwedawendên "*Agigi*" bi karên zor û zehmet rabin. Di pey wê ra hezar û dused sal derbas bûn, mirov êdî pir bûn û li ser rûyê zemînê pir qîjeqîj û qîreqîr peyda kirin ku êdî xwedayan nikarîbûn razên û xew bikin. Êdî biryar dan ku hejmara wan hinekê kêmbikin, û rabûn nexweşî û pirik xistin nav wan. Lê tevî wê jî, dîsa hejmara mirovan hên jî pir bû. Rabûn xela û pirçîbûn xistin nav wan, lê dîsa jî hejmara mirovan hên bilind bû. Rabû xwedawend "*Anlil*" biryar da ku mirovan di bin Tofanê da bihêle.

Xwedawend "*Anki*" (li gor gotûbêja babilî: Xwedawend "*Iya*") li civînên xwedawendan amade bû, û dîzanî ku çî dek û dolabê ji bo qelandina mirovan bi Tofanê amade dîkin. Rabû biryar girt ku bi awayekî neyekser vê agahdariyê bigihîne "*Ziusudra*" (*Utnapishtim*) ku bi aqilmendî û perestweriya wî bawer bû. Rabû berê xwe da wî dîwarê qamûşî yê mala ku "*Ziusudra*" lê rûdinişt (têda bû) û got:

"Dîwaro! Li min guhdar bike dîwaro!

Dîwarê qamûşî! Li peyvên min hemiyar guhdar bike!

Xaniyê xwe hilweşîne û keştiyekê durist bike!

Dest ji hemû hebûnên xwe berde û jiyana xwe rizgar bike!¹

Bûyerên Tofanê:

"Ziusudra" ev agahdariya "Anki" (yan jî xwedawend "Iya") fêhmkir û dest bi duristkirina keştiyê kir. Di hundirê heft rojan da keştiyek durist kir ku bilindbûna wê - li gor gotûbêja babilî - 120 gaz bûn û dirêjbûna wê jî 120 gaz bûn. Di keştiyê da heft qat hebûn. Rabû çî zêrê wî hebû û çî afrînber li ba wî hebûn tevî hemû malabt û xizimên xwe, tevî jîndarên zeviyan û jîndarên kovî û hemû kesên ku di avakirina keştiyê da beşdar bûbûn, ev hemî xistin keştiyê û deriyên wê bi temamî kîp girtin².

Li gor gotûbêja "Ziusudra" (*Utnapishtim*) ji *Gilgamêş* ra, êdî Tofanê destpêkir:

"Şeş roj û heft şev derbas bûn.

û hên jî bahozên Tofanê lêdidan.

Bahozên başûr welat di bin avê da hiştin.

Di roja şeşan da bahozên Tofanê sivik bûn.

Tofanê wek leşkerên di şerên giran da mirov didan ber xwe.

Min li asîman temaşe kir û dît ku bêdengiyek bi giştî heye.

Min dît ku mirov dîsa vegeyriyan û bûn çipil û herî.

....

Kulekek vebû û ronahiyê da rûyê min.

Ez çûme sicûdê û min dest bi girî kir.

Hêstir li ser rûyê min dibariyan.

Min li kenarên deryayê temaşe kir.

Min dît ku giravek bi sed metroyî û çel û çar gazan bilind bûye.

Keştî li ser çiyayê "Nisîr" rawestiya.

Çiyayê Nisîr bi keştiyê girt û nehişt êdî bicole (bilive).

Rojek û rojeka din jî derbas bûn û çiyayê Nisîr keştî girtiye û bernade ku here.

Û roja pêncan û şeşan jî çiyayê Nisîr hên keştî girtibû.

Gava roja heftan destpêkir, min kevokek anî û ew azad berda.

Kevok firiya, lê ew dîsa vegeyriya

Vegeyriya ji ber ku ti cih nedîtin ku lê dakeve.

Min Dûvmeqesok (meqesok) anîn û ew azad berdan.

Meqesok jî çûn û vegeyriyan ji ber ku ti cih nedîtin lê dakevin.

Di pey ra min qirikek derxist û serbest berda

Qirik çû û dema dît ku av êdî vekişiyaye.

Xwar, geriya, daket û nema vegeyriya.

Hîngê min her kesê ku di keştiyê da bû derxist.

Û min goriyek (qurbanek) serjêkir.

Min ava pîroz rijand ser kopa wî çiyayî

Min heft û heft qurban (14) û heft hille dan ser kuçên agir.

Min pûş û qamûş, darên merx û kajê xistin bin.

Bihna qijalê gihîşte xwedawendan.

Belê, bihna xweş gihîşte xwedawendan.

Xwedawend li ser xwediyên qurbanan wek mêşan civiyan.

.....

Dema "Anlil" hat û keştî dît pir hêrs bû

Ji kîna li ser xwedwendên "Agigi" tîjî bûbû û got:

Ev çî fêşe! Çawa ev hemû rizgar bûn?

Diviyabû ku ti mirov ji vê belayê rizgar nebana.

Rabû xwedawend "Nînûrta" (kurê Anlil) devê xwe vekir

**û gotinên xwe ji qehreman "Anlil" ra gotin:
Ji bilî "Ankî"(Iya)! Kî dikare dozeka wisa pêkbîne?
Belê "Anki" ye, yê ku sir û nehîniya tiştan dizane"³.**

Xwedawend "Anki" di ber xwe da berevanî kir û got ku gengaz û mimkin bû xwedawend "Anlil" mirovan bi sezayekî din ji bilî Tofanê seza bike û hejmara wan kêmbike, û got min sir û nehîniya xwedawendên payebilind nedaye der, lê min hêşt ku "Ziusudra" bi rêya xewnekê pilanê xwedawendan nasbike⁴.

Ziusudra berdewam kir û got:

"Di pey ra "Anlil" hilkişiya ser keşiyê.

Bi destê min girt û ez bi xwe ra li keşiyê siwar kirim.

Bi min ra kebanîya min jî siwar kir û hişt ku li tenişt min here sicûdê.

Ew di navbera me da rawestîya, bi destên me herdiyan girt û got:

{Heya niha Ziusudra tenha mirov bû.

Lê belê, ji niha û pêda Ziusudra wê li ber (devê çeman) dût be}.

Di pey ra ez dût birim û li ba (devên çeman) bi cih kirim"⁵.

Nasnameya çiyayê Tofanê çi ye?

Eve bi kurtahî çîroka *Tofanê* li gor gotûbêja somerî û babilî. Me navê qehremanê *Tofanê* bi awayê somerî "Ziusudra" gotibû, û niha tenha ma ku em li nasnameya wî çiyayê bikolin, ewê ku keşiya *Tofana Somerî* li ser dahatibû, gelo ew kîjane?

Dr. Fadil Abdulwahid Alî dibêje ku baweriya naskirî ya piraniya lêkolînerên nivîsên mîxî ji sala 1926-an da ewe ku **çiyayê Nisîr** (Nisîr) li Kurdistanê dikeve, û bi herhal ew çiyayê *Pîre Megrûne*. Ew dibêje bicihkirina çiyayê Nisîr li gor nivîsên padîşahê aşûrî *Nasirbalê Duwem* (882 - 859) hatiye çespendin ku bi welatê **Gotiyan** ra dide ber hev, ku ev çiya li başûrê **çemê Zap yê biçûk** dikeve (Spaeiser AASOr, VIII 1926 p. 17-18)⁶.



Dimenek ji çiyayê Pîre Megrûn

Di mîtolojiya aşûrî da, li gor efsaneyeka somerî hatiye ku keşiya *Tofanê* li ser **çiyayê Kinipa** rawestiyaye û Aşûriyan jêra **Nisîr** (Nisîr) digotin. Di pey ra Akkadiyan navê wî çiyayê kirin

"Quti" ku li ber çemê Zap yê biçûk dikeve; li welatê Lollo. Li gor wê, em dikarin bêjin ku ew çiyayê *Pîra Magrûn*-e⁷.



Dîmeneka din ji çiyayê Pîra Megrûn



Wisa çiyayê *Tofanê* di zincîra çiyayên başûrê Kurdistanê da dikeve, li welatê **Gotiyan** û **Lollo** (pêşiyên Kurdan). **Dr. Fadil Abdulwahid** dibêje ku *Pîra Megrûn* navê şêxekî şî'eyên îsmailî ye yê ku gora wî li kuntara vî çiyayî ye. Belkî jî navê wî yê bingehîn "Pîra Êmer Gûdrûn"e. Ev jî li gor ku **Speiser** gotiye û herwisa mamosta **Tewfiq Wehbî** di pirtûka xwe da (*Rêwîtiyek ji derbendî baziyar ta bi Mileyî Naslûce*", rûpel 28-29, çapxana Al-Mearif, Bexdad, 1965)⁸. Di gotûbêja zaniyarê kildanî **Berossos** (di sedsala sêhem b.z. da jiyaye) navê çiyayê *Tofanê* "**Gordoyaeen**"-e (yanê çiyayê Kurdan)⁹.

Çiyayê *Pîra Megrûn* ji çiyayên here bilinde ku li tixûbên welatê Somer dikeve. Dostê min mamosta **As'ed Qeredaxî** - spasî jêra heye - ji min ra got ku ev çiya bi dora 34 km li rojavayê

bajarê Sileymaniyê dikeve û bilindahiya wî 2625 metro ye. Hin caran heya bi havînan jî berf li ser kopa wî dimîne. Di wî çiyayî da baxên fêkiyan wek henar, hejîr, sêv, hilûk û tirî û tiştên din hene. Di nav baxan da ziyareta sofiyekî bi navê "*Pîre Megrûn*" heye.

Dîsa mamosta **As'ed Qeredaxî** got ku peyva "*Pîre Megrûn*" ji du beşan pêkhatiye: "*pîrem*" yanê şêx/mirşidê min û "*Gurun*" bi maneya yê nirxdar û pîroz. Ev peyveka ariyanî sansakrîfî kevîne; ew bingeha peyva "gewre" ya kurdiya niha ye. Ev tê wê maneyê ku ti peywendiya ziyareta "*Pîre Megrûn*" bi şî'eyên îsmâîlî ra tineye. Bi herhal ev di bingehê da ziyareta pîrozekî kurdên kevnar hên pêş misilmantiyê bûye.

Çarşemb, 08.07.2015

Jêder

¹ Se'îd Al-Āxanî: Destana Afirandinê û Tofanê, rûpel 13-14.

² Fadil Abdulwahid Ali: Tofan di jêderên esîmanî da, rûpel 64. Se'îd Al-Āxanî: Destana Afirandinê û Tofanê, rûpel 133-137.

³ Se'îd Al-Āxanî: Destana Afirandinê û Tofanê, rûpel 140-143. Li Wiliam Durant jî binêre: Çîroka Şaristaniyê, Bend 1, beş 2, rûpel 218.

⁴ Se'îd Al-Āxanî: Destana Afirandinê û Tofanê, rûpel 144.

⁵ Se'îd Al-Āxanî: Destana Afirandinê û Tofanê, rûpel 145.

⁶ Fadil Abdulwahid Ali: Tofan di jêderên esîmanî da, rûpel 74-75, nîşe 118.

⁷ Geofree Barnder: Baweriyên ayînî li ba gelan, rûpel 45. Û li Cemal Reşîd Ehmed binêre: Xuyabûna Kurdan di dîrokê da 1/16-17. Ahmad Arhim Hibo: Dîroka rojhilat ya kevnar (Sûriya), rûpel 110.

⁸ Fadil Abdulwahid Ali: Tofan di jêderên esîmanî da, rûpel 74.

⁹ Taha Baqir: destana Gilgamêş, rûpel 141, nîşe 160. Geofree Barnder: Baweriyên ayînî li ba gelan, rûpel 24.